**COMBINED JOINT TASK FORCE**
**OPERATION INHERENT RESOLVE**
**Public Affairs Office**

September 18, 2020
Release No. 20200918-01
**FOR IMMEDIATE RELEASE**

## Wesayitên Bradley ji bo piştgirî bide peywira OIRê li Sûriyê tên bicîh kirin

**Başûrêrojava-ASIYA** - Wesayîtên zirxî yên Bradley ji bo têkbirineke mayinde li dijî DAIŞê bi hevkariya Hêzên Sûriya Demokratik, li rojhilatê Sûriyê bi cîh bûn.

Hebûna piyadeyên mekanîzmayî ji bo operasyonên li dijî DAIŞê bi ewlehî bêdomandin dê hêzên Koalîsyonê û azadiya tevgera wan biparêze.

Berdevkê Koalîsyonê Col. Wayne Marotto got: "Hebûna piyadeyên mekanîzmayê, di parastina jîngeha xebata tevlihev de dê ji hêzên Koalîsyonê yên li bakurê rojhilatê Sûriyê re bibe alîkar. Herwiha, Hêzên Koalîsyonê di pabendiya xwe ya li dijî têkçûna DAIŞê ya mayinde de ranawestin."

Hêzên mekanîzmayî yên ku diçin Sûriyê ji Tîma Tûgaya Têkoşînê ya 2-emîn, Lîwaya 1-a Zirxî, Fort Bliss, Texas û ji bo piştgiriya Operasyona Mertalê Spartan a li Kuweytê ye tên û ji bo operasyona qada Fermandariya Navendî ya Dewletên Yekbûyî têne şandin.

Wezareta Parastinê herî dawî, di têkbirina DAIŞê de ji bo ku bi HSDê re hevkariyek çêbike ku bermahiyên DAIŞê têk bibe, binesaziya krîtîk biparêze û rê nede ku DAIŞ bigihîje çavkaniyên dahatê, di Cotmeha 2019an de li Sûrîyê Bradley'an ji nû ve veguheztibû.

-30-

CJTF-OIR Website CJTF-OIR Twitter CJTF-OIR Facebook CJTF-OIR Imagery
Email | CJTF-OIRmedia@mail.mil | Phone | +1.813.529.4636 | Kuwait | 00.965.221.6340 and 430-5193#
Mailing Address | CJTF-OIR Public Affairs | APO AE 09306